

Nûce û Calakî

Nûçe û Çalakî

3000 peyvên Kurdî di nav zimanê Rûsî de

Pispor û dîrokzanê Rûsî Vadi Akarenk , ji demeke dirêj ve, lêgerîn û lêkolînan li ser dîrok û zimanzan û ji 15 salan ve li ser dîrok û zimanê Mezopotamiya dike. Di Pirtûka xwe ya dawî de, ya li ser dîroka Mezopotamiya, dide xuyan , ku bingeha çanda Ewropa û Asiya dispêre Mezopotamiya.

V. M ji ANF re çêra lêgerînên xwe dike û weha dibêje " *A rast, heke mijar dîroka cîhanê an jî dîroka şaristaniyê be, erdnîgariya ku divê her kes xwe bigihîne û bi şeweyekî bingehîn têkilî wê bibe, Mezopotamiya ye. Ji ber ku dîrok û şaristanî li wir dest pê kiriye, mirov çendî bi nava kûraniyên dîrokê de diçe, xwe digihîne serdeşt û quntarên Mezopotamiya û Zagrosan. Ev xak yek ji girîngtirîn navendên veguhestina şaristaniyan e. Bê guman dema ku şaristanî derketine holê, hê nasnava netewebûnê tunebûye, lêbelê gelê li vir zeyînî û qet ev dever bi cî nehiştî û li vir mayî, Kurd in. Ji ber vê yekê jî, hizra min ew e, wekî li dîroka Kurdan û zimanê Kurdî were kolandin, ev yek ê di heman demê de tevkariyên mezin li ronîkirina dîroka mirovahiyê bike. Gava ku dîrokzanek li qonaxên dîrokî yên teqez dikole, ew her kîjan dîrokzan be, quntarên Zagrosan lê derdikeve. Di rastiya xwe de, ev dever ne rawestgehek e, rola wê ew e, ku termînaleke dîrokî û çandî ye. Lê ji ber ku dîroka roja îro bi kartêka neteweperestiyê şewe girtiye, her dîrokzanek serê pêşî bala xwe dide ser dîroka xwe ya neteweyî û dibe avjenvanê ava xwe. Lêbelê Mezopotamiya dibe ew dever, ku hemû lêgerînên dîrokî bivê nevwê wê werin tê re derkevin".*

Di dawiyê de, dide xuyan ku, di navbera zimanê Rûsî û Kurdî de, 3000 peyvên hevbeş tene

Dîtin û ev peyvên Rûsî ji Kurdî hatine wergirtin. Û Rûsan ne tenê ji warê ziman ve, belê ji warê çand ve jî, weke hemî gelên cîhanê gelek tişt ji çanda Mezopotamiya wergirtine.

Bi kurtî ji malpera Avêsta

Li Helebçe Peykerê D. Mîfîran

Di dema ku,ji bilî çiyaran dostên Kurdan tunebûn, xatûna Firansî, birêz Danyal Mîfîran hate hawara Kurdan û pişgiriyeke bê hempa ji bo gelê Kurd kir.



Lewre, ji bo piştgiyaya wê xanimê û bi beşdariya hin perlemantêrên Kurdistan , Îraq û berpirsiyarên navçeya Helebçe , li baxçeyê Helebçe, perde ji ser peykerê xatûnê rakirin. Hêjayî gotinê ye ku, ev peyker, ji aliyê hunermend Hamid Ehmed ve hatiye çêkirin.

Roja Newrozê, Rojeke Navnetewî ye

"Newroz Roja nû ye", li cîhanê, bêtirî 300 milyon mirov bi boneya vê rojê -ji 300 sal ve-, şahiyên li dar dixin. Lewre, komela giştî ya milletên hevgerî, ev roj, weke rojeke nevnêwî pejirand.

Hêjayî gotinê ye ku , biryara K.G. ya nevnêwî, ji aliyê nûnerê Ezerbêcanê ve hatibû pêşkêşkirin.

Gelo: Destlata me li Sûriyê, piştî vê biryarê, wê li xwe vegere û bi ser xwe de bipûnîje , daku ew jî biryareke weha bistîne ..an na?!

